# Di Navbera Kurd(î)parêz Ahmedê Xanî û Netewperwer Hecî Qadirê Koyî de Pirayeke zêrîn Xewsî

**Sedat ULUGANA**[1]

**Kurte**

Tê zanîn ku di sedsala hevdehmîn de edîb, şair û fîlozofê Kurd Ahmedê Xanî di berhemên xwe de sîyaseta mîrê kurdan a di gel Safevî û Osmaniyan ya hevdem rexne kiriye. Ahmedê Xanî yekem car di berhemên xwe de li ser hewcetiya yekbûna kurdan rawestiyaye. di berhemên Xanî de fikra kurd(î)pasartiyê qewî ye. Tê zanîn ku Xanî li Herêma Bazîdê, di bin sîha Mîrektiya Bazîdê de jiyaye û di medreseyên heman mîrektiye de mamostetî kiriye.Her weha Xanî li gor xwe ekoleke Kurd ava kiriye. Şairê Kurd Xewsî, yê ku min dîwana wî ya wenda keşf kiriye, , di navbera salên 1740-1784an de li jîyanê de bûye û şahidiya çêkirin û qedandina Qesra îshaq Paşa ji kiriye. îhtimalek mezin xwndavenê Ahmedê Xanî buye. Di Diwana xwe de rexneyan li mîrên kurd yên ku ji bo Osmaniyan li hemberî Gurciyan şer dikin kiriye. ew ji ekola Ahmedê Xanî ye.Tê zanin ku piştî van her dû edîban ,sed sal şun de Hecî Qadirê Koyî xwedî fikra netewî ya kurd e. Xuyaya ku H. Qadirê Koyî hay ji ekola Ahmedê Xanî hebûye. Koyî piştî Xewsî ,di sedsala 19.mîn de duajoyekî qewî yê vê ekolê bûye.

**Bêjeyên Sereke** : Kurd, Ahmedê Xanî, Xewsî , Hecî Qadirê Koyî, ekol, Îshaq Paşa, Mîr, Kurd(î) parêz

---

[1] Doktorant, Zanîngeha EHESS (Ecole des hautes études en sciences sociales) Parîs / Fransa

**Kurtebêj**

**c : ** Cild

**h : ** Hejmar

**r : ** Rûpel

**h.b : ** Heman berhem

**bnr : ** Binhêre

**wer : ** Werger

**Destpêk**

**1.Ahmedê Xanî**

**1.1. Rewşa Kurdistanê a sosyal û sîyasî û Mîrektiya Bazîdê di Dema Wî de**

sedsala 16.mîn hem ji aliyê edebî û hem jî ji aliyê sîyasetê ve sedsala dîroka kurd a zêrîn e. Ji bîstan zêdetir mîrektiyên kurd ,di erdnigariya Kurdistanê ya çîyayî de xwedî hukumet û jiyaneke azad bûn.[2] Piştî şerê Çildêranê (1514) , bi dehan mîrektiyên kurdan yên ku ew ji holêrakirina dewleta Mervaniyan mêj ve li her deverê Kurdistanê belav bibûn , bi Osmaniyan re dikevin têkiliyên polîtîk û sosyal. Ev têkilî li hemberî dewleta Şîa (Safewî) ya ku tu şejklî desthilatdariya kurdan a Kurdistanê nedipejirand , hevpeymaneke qewî ava dike. Helbet cîhgirtina heman mezhebî ya kurdan û Osmaniyan bêhtir ev hevkirina di navbera wan de hêsan kiribû. mîrektiyên Kurdistanê ,Yekem car bi

---

[2] *Evliya Çelebi Seyahatnamesi*, c.10,Devlet basımevi ,İstanbul,1938,r.53-54

"Cezire,Amediye,Soran,Erdelan,Harîr,Penyanişî,Mehmûdî,Hekarî, Bitlîs,Hezo, Palû,Hîzan,Bazîd ,Muks,Şîrwan,Bargirî,Milazgir,Exil,Meyafarqîn,Dêrzîn,Girdikan,Heskêf,Karnî, Zîrkî, Xirûn,îsparît ,Dûzrikî" mîrektiyên herî binav bûn.bilî van mîrektiyan nêzî 200 mîrektiyên piçûk jî di her terefê Kurdistanê de cîh digirtin.

Qanûna Yavûz Selîm û duyemîn car jî teqes bi qanûna Qanûnî Sultan Silêman statûya wan hatibû dîyarkirin.[3] Mîrrektiya Bazîdê di jî di sala 1578an de ji aliyê Şahsîwar begê Eşîra Zîlan ve hatiye damezirandin. Bi eslê xwe ji herêma Sîlwan (Farqîn) nin ku ji wan re "Begên Silîvî" hatiye gotin. Elejgir, Gîhadîn , Eledax tev di nav sînorên mîrektiya Bazîdê de bûne.[4] Wek hemû mîrektiyên Kurdan ên din mîrektiya Bazîdê jî li ser li hevkirina di navbera mîrên kurd û Sultanê Osmanî Yavûz Selîm hatibû damezirandin lê statuya mîrektiyê ne "hukumet" bu, "yurtluk-ocaklik" bu. yurtluk-Ocak-lik ,wek hukumetan serbixwe nebûn. Tê de hukmê osmaniya pirtir derbas dibû,[5] mîrên vê mîrektiyê

---

3 Arşîva Topkapı Sarayı Müzesi No D.9772
"Begên Kurdistanê hê di dewra bavê min ê rihmetî Sultan Selîm Xan de bi dil û can ketine di bin hemeta dewleta îslamê û dîsa bi dil û can li hemberî Qizilbaşan çendan car şer û cidal kirine û peyvirên bixêr pêk anîne. Heta di dema min de jî ,dema ku min ji bo sefera Rojhilatê Serleşkerê Sultanî yê bi navê Îbrahîm paşa şande li wir, wî bi alîkarî û yekitiya begên Kurdistanê , heremên bi navên Azerbaycan, Xoresan ,Tebrîz û Bexda û kela û memleketên din fetih kir.Ez dizanim ku ,ji ber van xizmet, samîmîyet û fedakartiya begên Kurd , dayîna maf û peyvirên ku ew ji me dixwazin deynê hustûyê min e û divê ji bo dada li ser rûyê dinê bê cîh ev deyn li ser min vecîbeyek e.Bajar ,kela û sancaxên ku ev sedan sal in di bin desthilatdariya begên Kurdistanên de nin , dîsa wek temlîk (Mulk) min daye heman began . Dîsa ji bo her begekî sencaxan ,temlîkname hatiye nivîsîn û beratên wan hatine dayîn.derametên (hasilatên ) hemû Kela, bajêr,gund û mezreyên ku li ser hukmê beratê me daye van begên herêmî , bi mahsûlên xwe ve ji heman began û lawên wan û nebiyên wan re dimîne û ev maf û milk ji bav derbasî kur dibe (Neslen ba'de-neslin) me ev maf wek îhsan daye wan û dîsa mulknameyên begên sancaxan me daye wan.Ez emir dikim ku ,îro şûnde di eyaleta Kurdistanê de ,tevahiya sencaxên ku min dane begên herêmî, êdî bi temamî milkên wan in. îro şûn de yên wek "malîkane" bên îdarekirin.Ev begên kurd heta li ser dînê îslamê bin û ji Dewleta Elî ( Osmanî ) re sadiq bin , Tu ewlad û ejdad û helefên ku ji nîjada min tên , wezîr, beglerbegî , umera (emîr) û yên ku erka rêvebiriyê di destê xwe de dihewînin nikarin mudaxaleyî sancaxên ku di bin desthilatdariya begên kurd de nin bikin. bi tu şekli nikarin dest dirêjî van began bikin.fermana min ew e , bi tu awayî emrê ku min di vê babetê de daye neyê xerabkirin, tehrîfkirin ,tebdîlkirin,taxyîrkirin û tahvîlkirin. Bi tu şeklî tê de qelem nayê bikaranîn ( bac nayê sitandin) desthilatdarî ji bav derbasî kur, kur derbasî kur (neslen bade neslîn ) dibe.Dema begê sencaxê bimre, eyaleta wî ji holê nayê rakirin, li ser temlîknameya humayûn , bi temamî bi hidûdê xwe ve desthilatdariya wê dê bikeve destê kurê beg. Ger ku yekî zêdetir kurên wî hebin, eyalet dê di nav kurên wî de wekhevî bê parvekirin an jî kurên wî çawa dixwazin yê wisa rê ve bibin.Ger ku begekî van sancaxan bêewlad (bêzarok), bê eqarib here li ser rihma Xwedê , ev sancax ji begên xerîb û ne ji vê eyaletê re nayê dayîn. Yê li ser mişêwre û îtifaqa begên Kurdistanê ,êdî begên Kurdistanê kîjan begî an jî begzadeyî laîq dibînin dê bidin wî.Ez li ser wehdanîyeta Xwedayê Celal û Celîl sonda qesemê dixwim ku bi tu şeklî dijîtiya vê peymana hanê ya ku min di navbera xwe û begên Kurdistanê de darxistiye nakim û nayê kirin û ji vê peymanê ez venakişim. Ji bo xatirê serverê herdû cîhanan , heya ku begên kurd ji dostên min re dost û ji dijminên min re dijmin bibin, xaneya min re sadiq bibin divê bi tu şeklî ev fermana min neyê guhertin û neyê xerabkirin. Bi her avayî emirkirina vê fermanê bînin cîh.piştî min ,ji ewladê min re wessêt û emrê min ew e ku , bila rîayetê vê peymana ku min di navbera xwe û di begên kurd de darxistiye bikin . Bila ji vê peymarê re dilsoz û sadîq bin. Emelên wan bila ne dijî vê peymanê bibe da ku edet û pêvajoya ku ji bavê min Yavûz Sultan Selîm destpê kiriye berdewam bikin . Ez dua dikim ji Xweda re ,her kê ku dijî vê peymana ku min di navbera xwe û begên Kurd de , kirinên nebaş bike ,sadiqê vê peymanê nebe ,Bila Xwedê roja mehşerê (roja mezin ya hesabdayinê) wan di çîna zulimkar ,gunehkar mucrîman de wan
Her dem li ser sadaqat û rastiyê hereket bikin. Di oxira dîn û dewletê de karên baş bikin û dijî dîn û dewletê karênnebaş nekin . Taybetî beglerbegiyên Dîyarbekir û Bexdayê bila bi begên Kurdistanê yên di deverên wan de dijîn re yekitî û yekhelwest bibin da ku bikaribin li ser dijmin de biçin û mûvafaq bibin. Her dem alikariya hev bikin , di vê armancê de divê deqîqeyekî bile badilhewa sarf nekin. Reayayên ki di bin desthilatdariya wan de nin ,emanetê wan in. Divê zulmê nekin û nehêlin tu kes li ser reayayan zulmê bike."

4 Mehmet Gultekin, "Mîrên Herêma Bazîdê û Seraya Îshaq Paşa", *Zend* ,h.24 (payiz-zivistan) ,2016,r.5

5 Sedat Ulugana "Mîrektiya Bitlîsê di Êwra Evdal Xan de (1618-1664)" ,(Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Mekazanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Teza Mastirê ya Neçapbûyî),Mêrdîn,2014,r.39-42

Orhan Kılıç, "Yurtluk-Ocaklık ve Hükümet Sancaklar Üzerine Bazı tespitler", *OTAM*, h.10,Ankara,1999,r.119-137

wek hukumetan (Mînak : Bitlîs, Mehmûdî, Hekarî, Palû,Amedîye û Cizîr hukumet bûn) nikaribûn teqes li hemberî emrê Walî û Paşayên Osmaniyan serî bilind bikirana. Her wisa di sala 1655an de dema Melek Ahmed Paşa erîşê Bitlîsê kir , mîrê Bazîdê jî di nav refên Osmaniyan de bu.[6] Di navbera salên 1600-1700an de mîren herêma Bazîdê di bin emrê waliyên Eyaleta Erzurumê de bûn, wek fermî Bazîd jî herêmeke îdarî ya girêdayê heman eyaletê bû û ji erdnigariya mîrektiyê nû ve 3 "o-caklik" peyda bibûn: "Kela Bayezidê," "Eleşkirt" û "Dîyaddîn" [7] Di van salan de wek hemû mîrek-tiyên Kurdan ,mîrektiya Bazîdê jî dike di nav rewşeke xetere. Şerên Safevî û Osmaniyan, erdnigariya Kurdistanê wêran kiribûn.Mîrektîyên kurdan di bin deynan de bûn û kelayên Kurdistanê xirabe bûn. Di vê pêvajoyê de bajarê Bexdayê ji destê Osmaniyan derketibû û ketibû destê Safeviyan (1623). Safevî, piştî destxistina Bexdayê vê carê çev berdabûn Wanê.[8] Artêşa osmanî çendan car Bexda dorpêç kiribû lê ser neketibû û heyfa têkçûyînên Bexdayê ji mîrên Kurdan hildidan. Wezîrê Osma-niyan yê bi navê Husrev Paşa , serê dehan mîrên kurdan jê kiribû. Padişahê Osmanî yê vê êwrê Sultan Murad (IV.) bû.

Rêveberê Osmanî yê bi navê Ezîz Efendî di vê êwrê de "Islahatname"yeki amade dike û pêşkêşî Sultan Murad dike(1632-1633).Ev islahatnameya ku navê wê "Kanun-name-i Sultani Lil Aziz Efendi" ye, di beşa xwe ya sêyemîn de tespîtên rewşa mîrên kurdan dihewîne û ji bo heman rewşan çareseriyan pêşniyaz dike.[9] Li gor tespîtên Ezîz Efendî, sedema têkçûyînên artêşên osmaniyan ên li hemberî Safeviyan, xerabbûyina rewşên mîrên kurd in.[10] Li gor Ezîz Efendî kirinên rêvebirên osmanî, aborî û rêvebiriya mîrektiyan xistine rewşeke xetere. Ji ber vê yekê jî bêhêzbûna mîrên kurd, qedera

---

[6] Yücel Dağlı - Seyit Ali Kahraman *Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahatnamesi (4. Kitap-1.cilt),*, İstan-bul,2010,r.286-287

[7] Orhan Kılıç, " Ocaklık Sancaklar ve Bağlı Bulundukları Eyaletler",*Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi (Journal of Social Science),* c. 11, h. 1, Elazığ, Rebendan , 2001, r. 257-274

[8]Orhan Kılıç, *XVI. ve XVII. Yüzyılda Van*,Van Belediye Başkanlığı kültür ve Sosyal İşler müdürlüğü yayınları No.6, Van,1997,r.132

[9]Rêzan Ekinci, "Aziz Efendi'nin Islahatnamesi Üzerine",*Kürt Tarihi,* h.2, 2012,r.14-19

[10] Önder Beyter-Rêzan Ekinci,"Kürd Emirlerinin Muktedir Oldukları zamanlarda Yaptıkları Hizmetler",*Kürt Tarihi,h:*2, 2012,r.20-27

şerên di navbera Osmanî û Safeviyan de diqewimin kifş dike. Çawa ku me perên jor de jî behsê kiribû, Sultan Suleyman di navbera xwe û mîrên Kurd de ahîdnameyek amade kiribû û bi zelalî statûya mîrên kurd eşkere kiribû lê tu carî ev ahîdname bi temamî ji aliyê Osmaniyan ve nehatibû bicîh. Ji ber van çevtiyan pirsgirêkên di navber mîrên Kurd û rêvebirên Osmanî bêtir kûr bibûn. Armanca İsilahatnameya Azîz Efendî jî ew bû ku van pirsgirêkan ji holê rake. Ji ber ku Kurdistan "di sînorê Eceman de bendeke bêhempa" bû. Di van salan de Têkçûyîna Evdal Xan a li hemberî Osmaniyan, li ser rewşa hemû mîrektiyên Kurdan bandor kiribû. Di van salan de em dibînin êdî navê hakimên Bazîdê wek "Paşa" derbas dibe êdî, yanî Osmaniyan bêhtir dest dirêjî xweseriya wan kiriye, Lê dîsa jî di van salan de Li erdnigariya Kurdistanê de jiyana rojane di warê edebî û çandî de baş dimeşiya.Di bin sîha mîrên van mîrektiyan de bi dehan medreseyên bi nav û bi deng hatibûn damezirandin û bi sedan şair, edîp, zana dora wan civîbûn.

Li Bitlîsê medresya Îhlasiye, Şerefiye, Yûsûfiye, Nûhiye,Hecî Beg,Îdrîsiye, ;Li Cizîrê Medreseya Sor, Mîr Ebdal, Suleymaniye, Mecîdiye,Şazeh; Li Hîzan, medreseya Mîr Dawûd, li Muksê medresaya Mîr Hesen ; li Colemêrgê medreseya Zeynel Beg , Meydan ; li Xoşabê medreseya Etaxiye; li Derzînê medreseya Şaqûlî Beg; li Girdikan medreseya Nasir Beg; li Heskêfê medreseya Sultan Adil,li Amediyeyê medreseya amediyê , Qubexaneyê,li Dihê medreseya Tenzê û li Bazîdê jî medreseya Sînaniyeyê û ya Mûradiyê medreseyên herî binav û bideng bûn.[11]

### 1.2. Bandora Rewşa Sîyasîya Kurdan a Hemandemê ya li Ser Wî

Ahmedê Xanî yê ku di sala 1650-1651an de hatibû dinê , bêguman di van medreseyên Bazîdê de dest bi xwendinê kiribû. Di van salên xetere de ew hê zarok bû. piştî çend salan diçe Bitlîsê û li wir perwerdeya xwe ya medreseyê berdewam bike. [12] Li Bitlîsê rewşa sîyasî a ku mîrektiyên kurd tê de

[11] Abdulhakim Baş, "Sînorên Edebiyata Kurdî ya klasîk", Zanîngeh, 2015, http://zaningeh.net/sinoren-edebiyata-kurdi-ya-klasik/

[12] Ferhad Shakely, *Kurdish Nationalism in Mam û Zîn of Ahmad-î Khanî* ,Kurdish İnstitute of Brussels, Brussels,1992,r.22

nîn hîntir baş dihat xuyan, lewra Evdal Xanê mîrê Bitlîsê têk çûbû û ji Bîtlîsê têkiliya wî hatibû qutkirin , mîrên ku dewsa wî digirtin (mîr Bedredîn, mîr Şerefedîn ), di destê waliyê Wanê de bibûn leyîstok. Mîrên mîrektiyên wek Hîzan, Şîrwan, Zîrkî û Hezo yên ku di bin bandora mîrektiya Bitlîsê de bûn jî di heman rewşê de bûn. Êdî di nameyên ji aliyê paytextê ve (Stenbol) ku ji wan re dihatin şandin de bi avayekî eşkere dihatin tehdîtkirin. îhtamek mezin di van salan de di derdorên akademîk ‘u rewşenbîrî de ev rewşa ku mîrên kurdan tê de bû dihat nîqaşkirin , yanî bêhtir êdî rexneya sîyasî dihat kirin. Ev e Ahmedê Xanî di atmosfereke bi vî rengî de , di medreseyên ku tê de mîrên kurd dihatin rexnekirin de perwerde dibû. piştî perwerdehiya sereke ew riya Misrê digre û heya wir diçe û di ilmê de bêhtir kûr dibe, dema vedigere Kurdistanê ,dibîne ku rewşa mîrektiyan hîntir xerab bûye û êdî tenê çevdêriya sînorê Eceman dikin ji bo Osmaniyan (Rom) . İhtîmalek mezin li Misrê zengînbûna medrese û berhemên klasîk ferq dike da ku çawa biyanî biha didan edîban ,xebatên edebî ku ev yek li Kurdistanê pir qels e. Dema Xanî vedigere Kurdistanê , li Bazîdê di bin sîha mîrektiya Bazîdê ( avakirina Qesra Îshaq Paşa destpê kiribû Xanî jî li ser temelê qesrê dua kiriye) de dest bi xebatên xwe dike û xwendevanan dide xwendin.

Xanî di van salande dibîne ku qet tu tişt li vê deverê neguheriyaye, rewş ji berê xerabtir bûye. Lewra Şerên Osmanî û Eceman dîsa destpê kiribûn (1630-1690) , di navenda sadsala 17.min de Kurdistan bibû qada van şeran, mîrên kurd ji aliyê her dû împaratoriyan ve dihatin bikaranîn û bi destê wan bajar û gundên kurdan dihatin talankirin. [13]Ahmedê Xanî di Edebiyata Kurdî de yekemcar di berhema xwe ya meşhur di Mem û zîn ê de rexneyên sîyasî aniye ziman. Lewra “Kurmanc” bibûn birc ji dagirkeran re. Wî kurd gelamperî rexne dikirin. rexneya wî tenê ne hemberî rêvebiran bû, hemberî gel bû jî, ji ber ku nedixendin ,nedielimîn , biha nedidan van karanû nedibûn yek Bê guman ev rexneyên polîtîk bûn û fikr û ramanên edîb û rewşenbîrên kurdan ên heman demê bûn ku me ji devê Xanî dibihîst, Wî ji başûr (sînorê Kurdistanê kêleka Ereban) , heya bakûr (Sînorê Kurdistanê li

---

[13] İzeddin Mustafa resul, *Bir Şair Düşünür ve Mutasavvıf olarak Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn* ,(wer.Kadri Yıldırım ),İstanbul, 2007,r.65-81

serhedê kêleka gurciyan) di erdnigariya Kurdistanê de hemû mîrektiyên Kurdan li ber çavên xwe dîtibû û rewşa gişkan hindik zêde dişibiyan hev dû.

Lewra ne di başûr de Ereb serdest bûn ne jî li bakûr Gurcî … Ev her dû gel jî wek Kurdan bindestiyên Ecem û Osmaniyan bûn Kurda di van tixûban de bi wan re ne şer de bûn, ji bo dagirkerên xwe şer dikirin :

(…)

Bi'fkir ji Erab heta ve Gurcan

Kurmancîye bûye şibhê bircan

Ev Rûm û Ecem bi wan hesarin

Kurmanc-i hemîh çar kenarin

Herdu terefan qebîlê Kurmanc

Bo tîrê qeza kiryie armanc

Goya ku li serhedan kilîdin

Her taîfe seddekin sedîdin[14]

Ahmedê Xanî bi fikr û ramanên xwe ,di edebiyata Kurdî de ekolekî avadike. Ev e duajoyekî vê ekolê jî , şair û edîbê ku me nû keşf kiriye Xewsî bû. ji rexneyên sîyasî ên Xewsî em fehm dikin ku ew di bin bandora Xanî de pir maye.

## 2.Xewsî

### 2.1 Jiyan wî

Şairekî bi navê "Xewsî" heya niha di nav edebiyata kurdî de qet derbas nebûye ,yekem car di vê gotarê de dernas dibe. Ji ber ku heya niha nehatiye nasîn . Yekem car di saya vê gotarê de haya me yê bi şairekî kurd ê dema klasik çê bibe. Dîwana Xewsî[15] de helbestên wî yên Kurdî, Tirkî, Farisî

---

[14] Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn* , wer: M. Emin Bozarslan, İstanbul,1968,r.56

[15] Di sala 2011an de li navçeya Erdîş a girêdarê Wanê di sohbeteke bal çend hevalen de haya min pê çê bû da ku di destê birêz Abdurehman Çaxan de(niha hevşaredarê Erdîşê ye) dîwaneke ku tê de beşeke Kurdî jî cîh girtiye heye . Dema min xwest ez xwe pê re bigehînim ,mixabin birêz Çaxan ket zîndanê û qedera 2 salan tê de ma, 2013an de dema hat berdan min xwe pê re gîhand û wî jî bi dilekî germ ev dîwan ji bo xebatê teslîmê min kir.

û Erebî cîh girtine Ev yek dide nîşan ku ew şaîrekî pirziman e . xezel û tehmîsên wî pir serkeftîne û dîyar e ku ew di serdema xwe de di edebiyata klasîk de şaîrekî hosta bûye. Ji dîwana Xewsî em fehm dikin ku , wî helbestên xwe yên ku di dîwana xwe de tomar kirine , di navbera salên 1740-1775an de nivîsîye. Em vê yekê ji helbesta wî ya ku li ser mirina Ebdulfetah Paşa[16] fêr dibin:

Abdülfettah Paşa etdi rıhlet-i dünya-yı dûn [17]
İns-i cin matem dutup ‘alemde oldu gam-ı hüzûn

Ğaybden ervahine tarih kıldı bu kelam
Cennet-i azîme varup ‘İnna ileyhi raci’ûn’
fî sene : 1189

sala 1189 bi teqwîma hîcretê hatiye nîvîsîn, dema em vê teqwîme vedigerînin teqwîma mîladê , ew dike 1774-1775 . Her weha wî li ser mirina Çetecî Ebdulah Paşa[18] dîsa helbestek nivîsiye . Çetecî Ebdulah paşa di salên 1740î de tevî mîrên kurd li Serhedê li hemberî Nadir Şah , tixûb û sînorê

[16] Ebdulfetah Paşa hakimê Elaşgirê (Eleşkirt) û birayê Îshaq Paşayê Hakimi Bazîdê bû û lawê Mehmûd beg bûn. Piştî mirina wî birayê wî Îshaq Paşa dibe mîrê herêmê ku qesra navdar êdî li ser navê wî binav dibe.

[17] dema Ebdulfetah paşa ji dunyaya bêxêr koç kir
ins û cins kir şîn alem tijeh xem û xemgînî
Ji xeyibê rihê wî re kir ev kelam
Çûye behûşta ezîm , “Em ji Xwedê hatine û dîsa diçin li bal wî”
sal 1189

[18] Çetecî Ebdulah Paşa bi eslê xwe kurd bûye û ji Çermîka Dîyarbekirê dayik bûye. di navbera salên 1730-1759an de wîlayeta Wanê, Erzirumê û Dîyarbekirê tê de , paşatiya dehan wilayetan kiriye. leqeba “Çetecî” ji ber şerên wî yên ku çeteyên Kurd û Eceman re kiriye hatiye. mirovekî şair, xetat û alim bûye. Li qezaya xwe Çermîkê medreseyek çê kiriye li ser navê xwe. Di sala 1760an de miriye.
Bnr: İbrahim Yılmazçelik, “Osmanlı Hakimiyeti Süresince Diyarbakır Eyaleti Valileri (1516-1838)” ,*Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi (Journal of Social Science)* c.10.h.1, 2000,Elazığ , r.233-287

împaratoriya  Osmanî parastiye. Îhtimalek mezin di vê  heremê  de Xewsî ew  di van salan de nas kiriye.

jiyana Xewsî  di erdnigariya  Mîrektiya Bazîdê de derbasbûye. Her weha di dawiya dîwana xwe de pesnê Îshaq Paşa dide , tê zanîn  ku ew qesra meşhûr a Bazîdê  li ser navê wî  di sala 1784an de ava bibû :

Vezir-i âsaf-i devran  kim  Îshaq Paşa'dur [19]
Dilâ, ya'nî kim bir âlî-cenâb-ı ma'delet-pîşe
(…)
Zeban-ı kem-suhan vasfında kâsır gören âsafdur[20]
Eya Xewsî  adîmu'l-misil olan Îshaq Paşadur

Li gor texmîna min beytên di kitêbeya Qesra Îshaq Paşa  jî ji aliyê Xewsî ve hatiye nivîsîn  Yanî qesra ku Ahmedê Xanî temelê wê re dua xwendibû , kitebeya xwe jî ji destê Xewsî bû.lewra uslûb heman uslûbe:

Bin yüz ile doksan dokuz oldu buna tarih[21]
Îshak'a meram üzre kerem kıldu cîhanü

xuya ye ew ji derdora qesrê bûye, şairekî di bin sîha Ebdulfetah Paşa û birayê wî Îshaq Paşa de bûye. Ji aliyê wan ve hatiye parastin û debarkirin .  Xewsî di dîwana xwe de tenê pesnên Paşayên Kurd

---

[19] Wezîr Asafê heman demê Îshaq Paşa ye
Ango dad karê wî xweşmêrî (camêr) ye

[20] Ey Xewsî qesra dibînî ku(ji ber heybet wê) lal dibî
Asafê wê (qesrê) Îshaq Paşayê yekta ,bêhempa ye

[21] Hezar û sed û newhêdî jê re bû dîrok
Bi merama Îshaq ev di cîhanê de kerem kir

daye (Ebdulfetah paşa, Çetecî Ebdulah Paşa û Îshaq Paşa) di dîwana wî de pesnê tu paşa û padişahên Osmanî tineye. Ev yek baş dide nîşan ku ew xwedî raman û helwesteke "binecîhî" bû.

Di derbarê dayikbûna Xewsî de ,dîwana wî fikrekî nade me, Tenê çawa di helbestên wî de derbas dibe , emrê wî di navbera ciwantî û kaltiyê de ne. Ango em dikarin bibêjin ew teqrîben 40-50 salî bûye. Her weha vê gavê haya me bi dîroka mirina wî jî nîne. Di mecmûayên helbestan ên tirkî de jî em rastî agahiyeke di derbarê Xewsî de nehatin.

**2.2.Helbestên Wî yen Kurdî û Helwesta wî ya Sîyasî**

Me çawa di jor de jî behs kiribû ku beşek ji dîwana Xewsî Kurdî ye. Wî ev helbestên xwe yên Kurdî bi zaravayê Kurmancî nivîsîye. Devoka wî dewoka derdora Gîhadîh-Elajgir û Erdîşê ye. Helbestên wî yên kurdî li gor helbestên wî yên Tirkî-Erebî û Farisî hîntir serkeftî û bihuner in .Wî jî wek edîbên edebiyata klasîk hunerên edebî yên heman demê bikar aniye. :

Ger demek ez te nebînim ey dil-îşveya cîhan
Min di qelbê da îfayete ax û waweylayî tû
(…)
Dema ku gulşena husnê bi ezharan bikim azhar
Dikin bilbil ji şewqa wê fîxan û nalezara

Piraniya helbestên Xewsî yên Kurdî bi vî rengî ,di derbarê evîn , cûdabûn ,methû senaya Xwedê û pêxemberan de ne ,lê di nav van helbestên wî yên Kurdî de helbestek heye ku ji hemû helbestên wî cûdatir e. Wî ev helbest li ser dilketina mîrekî Kurd ê bi navê Mustefa Beg nivîsiye. Îhtimalek mezin Mustefa Beg ,mîrekî ji mîrên herêma Bazîd- Elaşgir, Gihadîn û wan derdora bûye. Çawa Xewsî

dibêje ,Mustefa Beg mîrê wî bûye. Ji vê helbestê fehm dikin ku , li ser Gurciyên "Açixbaş" [22]sefereke Osmaniyan çê bûye û ev mîr jî tevê seferê bûye û li wir dîl ketiye û carek din venegeriyaye li ser mîrektiya xwe . Xewsî bi rastî jî ,ji ber dilketina wî pir li berxwe ketiye ,hêstên xwe bi dilekî pir xemgîn aniye ziman. Di vê helbestê de mirov baş dibîne ku ew ji bo mîrê xwe pir xemgîn û biêş e :

Başaçixan bûye sefer
çû ew emîrê mûteber
Ew ma li wê cîh bê mefer
kanê Mustefa Beg naxuyê
(…)
Ebdal buyî mal û hewliya
derdan dikêşî di rêya
Mîrê te bû ey Xewsîya
Kanê Mustefa Beg naxuyê

Xewsî , bi vê helbesta xwe , di edebiyata Kurdî de piştî Ahmedê Xanî cara duyem rexneya sîyasî a kurdan kiriye. dîyar e ku wî ji Ahmedê Xanî pir bandor girtiye, ew bêguman ji ekola Xanî ye. Çawa ku em dizanin Xanî di sala 1707an de çûye li ser dilovaniya xwe. İhtimalek mezin dema Xanî wefat kiriye Xewsî hatiye dinê an jî wê demê de Xewsî hê zarok bûye . Çi îhtimal bibe bila bibe , dîyar e ku haya Xewsî baş bi Ahmedê Xanî çêbûye û Ahmedê Xanî baş şopandiye. İhtimalek mezin Xewsî

[22]"Açixbaş Solomon" mîrekî Gurcuyan bûye û di navbera salên 1757-1768an de serî li hemberî Osmaniyan rakiriye. Osmanî bi tevahiya mîrên Kurdan (taybetî Mîrên herêma Bazîdê) bi dehan seferên leşkerî li ser wî çê kirine lê ew têk nebirine. Tê zanîn ku di nav Împaratoriya Osmaniyan de "koleyên Gurcî" meşhûr bûn. Serê salê , mîrên Gurciyan mecbûr bûn ku bi hezaran koleyên Gurcî ji rêvebirên Osmanî re bişandana. Dema Açixbaş Solomon li ser mirina bavê xwe derdikeve textê Açixbaş (Îmeret) cara pêşî firotana koleyan a ji bo Osmaniyan qedexe dike paşê jî dike ku hemû herêmên Gurcisyanê bigîhîne hev dû û welatekî serbixwe ava bike. Her weha şerên wî yên li hemberî mîrên Kurd û aliyên Osmaniyan pir çetîn derbas dibe û ew zîyaneke mezin dide wan
Ensar Köse , "Osmanlı Devleti ve Solomon I. : İmeret'te Hakimiyet Mücadelesi (1752-1768)" ,*İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Tarih Dergisi*,h.60 (2014/2) ,İstanbul ,2014,r.43-96

ji medreseya Ahmedê Xanî ku tê de ders daye istifade kiriye û bûye duajoyekî wî yê serkeftî û belkî jî nêzî mirina Xanî ,xandevanekî Xanî bûye.

Mirov dikare bibêje rexneya Xewsî ya polîtîk ji ya Ahmedê Xanî vekirîtir û safîtir e . Rexneya Ahmedê Xanî ji bo tevahiya “Kurmancan” e ,lê ya Xewsî lokal e , li “mîrên kurdan” hatiye kirin. Di vê bendê de rexneya wî bi serê xwe yekem e û cûda ye. Heya Xewsî tu edîbî bi avayekî hinde vekirî “mîrên kurd” rexne nekiriye. Ev yek heya di rexneyên Xanî de jî tineye. Ango Xewsî, rexne rast e rast teslîmî navnîşanê kiriye. Çawa Ahmedê Xanî gotibû:

Bi'fkir ji Erab heta ve Gurcan
Kurmanc bûye şibhê bircan

Piştî Xanî teqrîben 70 sal şûn de Xewsî li ser dilketina mîrekî kurd a li “Gurcan” rexneyeke pir tûj li tewahiya mîrên kurd kiriye di heman helbestê de :

Çend padîşah ew rakirin
Xapand hinek ew şakirin
Paşê hemû wenda kirin
Kanê Mustefa Beg naxuyê

Ev malik tena bi serê xwe , “helwesta rewşenbîr û edîbên kurd ên ji ekola Xanî ya sedsala 18.min” e. Tiştên ku wan didît mîrên kurd nedidîtin , lewra Kurdistan wêran bibû û gel jî perîşan bibû lê ev yek ne di xema mîrên kurd ên bêvîzyon de nebû. Tenê wan ji bo “efendîyên xwe” şer dikirin, dema aramiyê de jî gora hev dû dikolan ,hev talan dikirin û kîsikên xwe tijeh dikirin. Tinekirin û rûxandina wan ji destê padişahan bû ,lewma Xewsî “padişanan” tawanbar dike.

Xûya ye ku Xewsî ji aliyê mîrekî wek Îshaq Paşa û birayê wî Ebdulfetah Paşa ve hatiye parastin , dema ku van mîran ew parastiye ,helbet haya wan ji van rexneyên Xewsî jî çêbûye . Yanî şair dikaribû di bin sîha mîran de siyaseta wan a beravajî rexnebikira . Ango ev tê wê wateyê mîrên Kurd jî maf dane van rexneyan. Ji ber van rexneyan edîbekî wek Xewsî şermezar nekirine û nerizandine û xwedî derketine.Di vir de em dibînin ku di sedsala 18.mîn de psikolojiya mîrên Kurd û raya gîştî bi vî awayî ye.

**3. Hecî Qadirê Koyî**

**3.1.Jiyan wî**

Koyî yê ku di sala 1816an de dayik bûye heya kaltiya xwe emrê xwe di Kurdistanê de derbaskiriye. Kurdistana sedsala 19.mîn ,ji sedsala 17.mîn û 18.mîn bêtir di bin lingên Osmanî û Îraniyan de diper-çiqî . Dewleta Osmanî biryar girtibû da ku ber bi “dewleteke navendî” de biçe.[23] Pêwîst bû ku di erdnigariya dewletê de çi “feodalîte” hene ji holê rakin. Lewma herî pêşî berê xwe dan Kurdistanê û bi mîrektiyen kurdan re ketin di nav şerên demdirêj.[24] Dawiya van şeran de hin mîr îqna kirin ku ew wek memûrên dewletê li ser milkên xwe rawestin ; yên ku îqna nekirin ew yan kuştin yan jî mişextî deverên dûrî Kurdistanê kirin. Di nav van hemû hewildanan de bêguman zirara herî zêde Kurdên sivîl didît.[25] Osmaniyan navê van seferen lêkiribûn “ fetihkirina Kurdistanê a nû ve” . Di serdema Hecî Qadîrê Koyî , li hemberê dagirkirina Kurdistanê , 10 serhildanên kurda çêbûne. [26] Piştî van serhildanan piraniya mîrên Kurd hatine tasfîyekirin û dewsa wan taybetî Şêxên Kurd girtine û bi vî avayî ji kadegoriya serdest û rêvebirên kurdan kategoriyeke nû zêde bûye.

---

[23] Bnr: Halil İnalcık, Mehmet Seyitdanlıoğlu, *Tanzimat:Değişim Sürecinde Osmanlı İmparatorluğu* , İstanbul ,2014

[24] Musa Çadırcı , “Tanzimat’ın Uygulanması ve Karşılaşılan Güçlükler (1840-1856)” ,*Mustafa Reşit Paşa ve Dönemi Semineri Bildiriler,* Ankara 1987,r.97-104.

[25] Hıdır Göktaş, *Kürtler : İsyan -Tenkil,* İstanbul,1991,r.11-20

[26]Serhildana Baban-zade Abdûrehman Paşa (Silêmanî ,Mûsûl-1806) ,Serhildana Baban-zade Ahmed Paşa (Mûsûl-1812), Serhildana Kurdên Zaza (1820),Serhildana Kurdên Êzidî (Hekarî-1830), Serhildana Şeref Xan (Bitlîs-1831) ,Serhildana Mîr Bedixan (Botan-1835-1840) Serhildana Xerzan (Diyarbekir-1839), Serhildan Êzdîn Şêr (Botan 1854), Serhildana Bedirxan Osman Paşa (Mêrdîn-Cizîr-1877) serhildana Ubeydullah Nehrî (Hekarî-1881),Serhildana Bedirxan Emîn Elî (Erzincan-1889)

Koyî di nav atmosfera van serhildanên Kurdan û talan ,qetilkirinên Osmaniyan de di medreseseyên wek Şîno ,Serdeşt , Sablaxê de perwerde bibû ,ji Ahmedê Xanî û duajoyên wî haydar bibû.Li herêmên wek Kerkûk,Silêmanî û Mehabadê geriyabû. û lii wan deran rewşa gel li ber çavên xwe dîtibû. Wî jî wek Xanî û Xewsî rêveber û şêxên Kurd rexne kiriye. Helbestên xwe di dîwanekî de tomar kiriye. Ji ber rexneyên xwe yên tûj ,xezeba şêx ,axa û begên kurd kişandiye ser xwe. Di jiyana wî de em dibînin ku ew mirovekî pir bimeraq û mêjûvekirî bûye.[27]

Bawerim klasîkên dema modernîzmê jî baş şopandiye. ji ber hewcetiya fikr û ramanên modern û sazîkirina netewa Kurd berê xwe dide Stenbol û li wir malbata Bedirxaniyan re mamostetiyê dike. Ango temelê “Malbata Kurd(î)parêz, netewperest Bedirxananiyan” ew çê dike. Ew ji aliyê modern ve “bavê netewperestiya Kurd” e.

### 3.2 Duajotiya Wî ya Ekola Ahmedê Xanî û Helwesta wî ya Sîyasî

Koyî wek Xanî bihayekî giran daye zimanê Kurdî , Her çiqas di nax xîzanî û rewşeke nepak de bû jî ,wek hîn şairan ji bo rêvebirên Osmanî an jî Îranî bi zimanê wan helbest nenivisiye.”Ekrad bûyîn” ji bo wî rûreşiyek nebû ,dilşahî û serbilindiyek bû. Me çawa di jor de jî gotibû ew ji ekola Xanî bû, Xanî li ser wî tesîreke mezin hîştibû:

Ehmedê Xanî sahibî Memozîn[28]

Şahbazî fezay ‘îllîyîn

(…)

Le eyyamî heyatî şêxî Xanî [29]

Le ser nusxey xetî ew nûsrawe

---

[27] Aso Zagrosî,“Haci Qadri Koyi”,*Aso Zagrori Blog*,20 Avrêl 2009,http://aso-zagrosi.over-blog.com/article-30477328.html

[28] Hacî Qadirî Koyî , *Dîwan*, Stockholm,2004,r.129

[29] h.b.,r.21

Lê hema nebe, çiqas bêhêz û bêvîzyon bûn jî di dema Xanî de mîrektiyên Kurd hebûn lê di dema Koyî de ew jî tinebûn, Ji bo wî “Mirektî” nostaljî bû êdî ,wî xweziya xwe pê sedsala 17.mîn qet nebe rewşa Kurdan a sedsala 18.mîn dianî :

Gelêkim bîstûwe hem şabûn,serapa bêxemû şa bûn
Cîhan neydîtuwe pestî mîsalî hakimî Kurdan [30]
(…)

Kîwa walîyî Senenduc,bezadeyî Rewandur [31]
Kîwa hakîmanî Baban mîrî Cîzî û Botan

Çawa em dizanin Xanî hewcetiya bi mîsyona Padişahî mîrekî Kurd” ditît û Xewsî jî ji ber “xwe bikaranîna mîran a ji bo padişahan” rexne dikir ; lê Koyî ji herdûkan derbas dikir , ji bo wî çare “mîr” û “padişah” nebûn, çare gelê kurd bixwe bû. Hatina Koyî a Stenbolê nîrxandin û nêrîneke modern bi wî dide qezenckirin. Êdî ji berê baştir haya wî bi amurên nû, têgehên cûrbecûr , rojeva netewî û navnetewî çê dibe. Ji ber ku Ermeniyan hîn wîlayetên bakûrê Kurdistanê wek “Ermenistana Rojava” binav dikirin û di nav raya navnetewî de propagandaya vî şeklî dikirin , Koyî di helbestê de êdî bêhtir li ser “ Welatê Kurdan” disekine. Yanî reaksîyona netewî a Ermeniyan di şexsê Koyî de reaksiyona netewî a Kurdan qewî dike :

Xakî Cizîr û Botan ye’nî wîllatî Kurdan[32]
Sed heyf û sed mixabin deyken be Ermenistan

---

[30] Mesûd Serfiraz, “Di Helbestan de Parçebûna Kurdistanê : Bi mînakên ji Xanî ,Koyî,Lahûtî û Cegerxwîn” ,*Wêje û Rexne* , h.3,2014,r.252

[31] Koyî,*Dîwan* ,r.84

[32] h.b.r.83

Di Ahmed Xanî û Xewsî de, mîr ,qesr,kela,qebîleyên Kurdan dîyar in lê welatê Kurdan aşîkar nîne , ev e di Koyî de welatê Kurdan dîyar e yanî “Kurdistan e. Dema Koyî dibêje “ welat” , ew welat, wek helbestvanên din “gund” an jî “bajar” ê wî nîne , ew welat hemû Kurdistan e û welatê welatê “netewê Kurd” e.Her weha ew peyva “dewlet” ê jî di wateya “dewlemenî, zengîntî” yê de bikar nayne, dewlet , di wateya welatekî serbixwe de bikar tîne.[33] Wekî din Xoyî li ekola Ahmedê Xanî, ji welat bêtir du têgehên modern zêde dike ku ew jî “weten” û “mîllet” in

Arê be hedîs û nessî Quran [34]

Hubbî weten e delîlî îman

(…)

Bo fennî herb û sen’et ,bo zebt û rebtî mîllet [35]

Deynêrîne Urûpa gewre û piçûkî xoyan

(…)

Her êke musteqîl in , kullêkî dewletêk in [36]

Sahîbî ceyş û rayet,erkanî herb û meydan

**Encam**

Ehmedê Xanî bi fikr û ramanên xwe bêguman ekoleke nû avakiriye. Mirov dikare ji vê ekolê re bibêje “ekola kurd (î) parastinê”. Em nikarin j têgeha “netewperst” ji bo wî bikar bînin ,Wî Kurd(î)perweriya xwe di nav nexşîbenditiyê de hewandibû. “Netewperesti” têgeheke modern a sed-sala 19.mîn û 20.mîn e. Lê mirov dikare bibêje , “wî îlham daye duajoyên xwe yên sedsala 18.mîn ,

---

[33] Farangis Ghaderî, “Hacî Qadirê Koyî û Hilatina Neteweperweriya Kurdî” ,*Zarema* ,h.2, Dîyarbekir, 2014, r.46-47

[34] Koyî,*Dîwan* ,r.111

[35] h.b.,r.84

[36] h.b.,r.85

19.mîn û 20. mîn de ku jiyane". Îhtimalek mezin di nav edîb û rewşenbîrên kurdan de di navbera salên 1650-1890 de bi dehan belkî jî bi sedan duajoyên vê ekolê çêbûne ji ber ku mîhenka vê gotarê "Xewsî" vê yekê pir bi zelalî dide nişan. Di sedsala 18.mîn de bi saya serê duajoyên ekola Ahmedê Xanî ên wek Xewsî , "ramana Kurd(î)parêziyê" û "rexneya polîtik" yê xwe bigîhîne sedsala 19.mîn . Bê guman di sedsala 19.mîn de edîbê kurd ê kurd(î)parêz heya em jê re dikarin bibêjin "netewperest" Hecî Qadirê Koyî bû. Xewsî bi rast e rast nebe jî fikr û ramanên Ahmedê Xanî gihandibû dema wî . yanî di navbera her du yan de peywira pirayekî aniye cîh. Koyî jî di sedsala 19.mîn de li "ramana Kurd(î)parêziyê" û "rexneya polîtik" , têgeh û termên wek "welat" ,"mîlet", "wetan" û "dewlet (di wateya serbixwebûnê de)" zêde dike û netewa Kurd di warê edebiyatê de di asta modern de diedilîne . Bi wî şeklî ramana netewî û rexneya sîyasî ya kurdiyetiyê xwe digîhîne roja me.

**Çevkanî**


Arşîva Topkapı Sarayı Müzesi No D.9772

Baş, Abdulhakim,"Sînorên Edebiyata Kurdî ya klasîk", Zanîngeh, 2015, http://zaningeh.net/sinoren-edebiyata-kurdi-ya-klasik/

Beyter,Önder-Ekinci,Rêzan,"Kürd Emirlerinin Muktedir Oldukları zamanlarda Yaptıkları Hizmetler",*Kürt Tarihi,h:*2, 2012

Çadırcı, Musa, "Tanzimat'ın Uygulanması ve Karşılaşılan Güçlükler (1840-1856)" ,*Mustafa Reşit Paşa ve Dönemi Semineri Bildiriler,* Ankara 1987

Dağlı,Yücel - Kahraman Seyit Ali , *Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahatnamesi (4. Kitap-1.cilt),* İstanbul,2010

Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn ,* wer: M. Emin Bozarslan, İstanbul,1968

Ekinci,Rêzan, "Aziz Efendi'nin Islahatnamesi Üzerine",*Kürt Tarihi,* h.2, 2012

Evliya Çelebi Seyahatnamesi, c.10,Devlet basımevi ,İstanbul,1938

Ghaderî, Farangîs, "Hacî Qadirê Koyî û Hilatina Neteweperweriya Kurdî" ,*Zarema* ,h.2, Dîyarbekir, 2014

Göktaş,Hıdır, *Kürtler : İsyan -Tenkil,* İstanbul,1991

Gultekîn, Mehmet, "Mîrên Herêma Bazîdê û Seraya Îshaq Paşa", *Zend* ,h.24 (payiz-zivistan) ,2016

Hacî Qadirî Koyî , *Dîwan,* Stockholm,2004

İnalcık,Halil-Seyitdanlıoğlu,Mehmet,*Tanzimat:Değişim Sürecinde Osmanlı İmparatorluğu* , İstanbul ,2014

Kılıç, Orhan, “Yurtluk-Ocaklık ve Hükümet Sancaklar Üzerine Bazı tespitler”, *OTAM*, h.10,Ankara,1999

Kılıç,Orhan“ Ocaklık Sancaklar ve Bağlı Bulundukları Eyaletler”,*Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi (Journal of Social Science)*, c. 11, h. 1, Elazığ, Rebendan , 2001

Kılıç,Orhan, *XVI. ve XVII. Yüzyılda Van*,Van Belediye Başkanlığı kültür ve Sosyal İşler müdürlüğü yayınları No.6, Van,1997

Köse ,Ensar, “Osmanlı Devleti ve Solomon I. : İmeret’te Hakimiyet Mücadelesi (1752-1768)” ,*İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Tarih Dergisi*,h.60 (2014/2) ,İstanbul ,2014

Resul,İzeddin Mustafa ,*Bir Şair Düşünür ve Mutasavvıf olarak Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn ,(*wer.Kadri Yıldırım ),İstanbul, 2007

Serfiraz,Mesûd ,“Di Helbestan de Parçebûna Kurdistanê : Bi mînakên ji Xanî ,Koyî,Lahûtî û Cegerxwîn” ,*Wêje û Rexne ,* h.3,2014

Shakely, Ferhad,*Kurdish Nationalism in Mam û Zîn of Ahmad-î Khanî* ,Kurdish İnstitute of Brussels, Brussels,1992

Ulugana,Sedat,“Mîrektiya Bitlîsê di Êwra Evdal Xan de (1618-1664)” ,(Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Mekazanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Teza Mastirê ya Neçapbûyî),Mêrdîn,2014

Yılmazçelik,İbrahim, “Osmanlı Hakimiyeti Süresince Diyarbakır Eyaleti Valileri (1516-1838)” ,*Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi (Journal of Social Science)* c.10.h.1, Elazığ,2000

Zagrosî,Aso,“Haci Qadri Koyi”,*Aso Zagrori Blog*,20 Avrêl 2009,http://aso-zagrosi.over-blog.com/article-30477328.html